Dê û bavên û karwanên hêja

**Debarî: Berhevoka Neteweyî ya Daneyên Li Ser Xwendekarên Dibistanê yên Astengdar**

**Re: Nationally Consistent Collection of Data on School Students with Disability (NCCD)**

Her sal, hemû dibistanên li Australya beşdarî Nationally Consistent Collection of Data on School Students with Disability (NCCD) dibin. Pêvajoya NCCD ji dibistanan re hewce dike ku agahîyên ku jixwe li dibistanê hene nas bikin derbarê piştgirîyên ku ji bo xwendekarên astengdar hene. Ev, li gorî rêgezên NCCD'ê, bi Qanûna Cudakariya Astengdariyê ya 1992 û Standartên Astengdariyê yên Perwerdehiyê ya 2005 ve girêdayî ye.

Zanyarî derbarî xwêndkaran ji aliyê Hukûmeta Australya bo NCCD ne, di nav de:

- sala xwendinê
- Kategoriya astengdariyê: fîzîkî, hevnasî, hestyarî an jî civakî/hestî
- Asta eyarkirinê hatiye peydakirin.

Ev agahî alîkariya dibistanan dike:

- Di dibistanan de piştgirî û sererastkirinên ku ji xwendekaran re hatine dayîn bi awayekî fermî nas bikin
- Bifikirin ka ew çawa dikarin piştgiriya ku li dibistanan ji xwendekarên astengdar re baştir bikin
- Şarezayên mamosteyan bi pêş bixin da ku karibin bernameyên fêrbûna xwe ji bo pêşxistina encamên perwerdeyê ji bo xwendekarên astengdar lêkolîn bikin.

NCCD, ji bo piştgiriya xwendekarên astengdar agahiyên ku divê bi berfirehî plan bikin dide hikûmetên wîlayetan û fêderal.

NCCD dê rasterast bandorê li zarokê we neke û zarokê we dê di tu pêvajoya têstê da cih nede. Dibistan dê daneyên Hikûmeta Australya bide bi vî awayî ku ti xwendekar neyên nas bikin - nepenî û nepenîtiya hemû xwendekaran tê dabîn kirin.

Hemû agahdarî ji hêla qanûnên nepenî yên ku berhevok, hilanîn û eşkerekirina agahdariya kesane ve tê parastin.

Ji bo zêdetir bibînin li ser van mijaran, ji kerema xwe serî li Siyaseta Nepenîtiyê ya Hikûmeta Australya bidin (Australian Government's Privacy Policy https://www.education.gov.au/privacy-policy).

Agahîyên zêdetir yên derbarê NCCD de dikarin li ser NCCD Portal (https://www.nccd.edu.au) werin dîtin.

Heger di derbarê NCCD de pirseke we hebe, ji kerema xwe bi dibistanê re bikevin têkilîyê.

Heger hewcedariya we bi wergêrekî hebe ku ji bo alîkarîya lêpirsîna we bike ji kerema xwe telîfonî 131 450 bikin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin. Ji operatorê re hejmara telîfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar wê operator li ser xetê wergêrekî bibîne. Ev xizmet belaş e.

Midûr

Têbîn: Beşa Perwerdeyê ya NSW ji peydakirina wergerên vê nameyê ve berpirsyar e. Wezaret di nameya orîjînal de hin guhertinên biçûk kirin. Ev guhertin bi bikaranîna zimanekî hêsantir li ku derê pêwîst e û zêdekirina li ser çawaniya bikaranîna xizmeta wergernadina têlîfonê da ku ji bo agahîyên zêdetir bi dibistanê re bikevin têkiliyê.

Kurdish Kurmanji

Ji aliyê Wezareta Perwerdeyê ya Hikûmeta Australya ve tê destekkirin

© 2022 Education Services Australia Ltd, heta ku bi rengek din nîşan neda. Creative Commons BY 4.0, heta ku wekî din nehate dîyarkirin.

Education Services Australia

Australian Government